


## Li Parîsê TRT şermezar kirin

Li Parîsê di çalakiya 'Êlek Zeran' a duh de dîmenek balkêş ê çalakvanek tirkiyeyî ku tev li çalakiyan bûye hat belavkirin. Yek ji çalakgerên 'Êlek Zeran' ekîba TRT'ê ya ku nûçeyan dişopîne protesto kir û wiha got: "Zilma li welatê xwe nake nûçe tê Parîsê dike nûçe." Çalakger jê re got ku Macron jî, Tayyîp jî û hûn ê jî tev biçin.

## Çalakiya 'Êlek Zeran' berbelav dibe



LI PAYTEXTA Fransayê Parîsê çalakiya "Êlek Zeran" a li dijî qeyrana aborî û zema sotemeniyê berdewam dike. Komên li cihên cuda yên Parîsê kom bûn, di dema meşê de polîsan êrîşî çalakgeran kirin û zêdetirî 700 kes hatin binçavkirin. Her wiha çalakiya 'Êlek Zeran' berbelavî Hollanda û Belçîkayê jî bûn... RÛPEL - 4


# e-rojname

9 Kanûn - Yekşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 199


## Rêwîtiya NÇM'ê ya 27 salan




Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) dê îro bi dirûşma; 'Bi hev re' li Navenda Pêşandanê ya Bostanci şahiya salvegera xwe pîroz bike. Dê gelek hunermend beşdarî şahiya NÇM'ê bibin û bang li hemû kesan hat kirin ku beşdarî şahiyê bibin. NÇM'ê di xebatên çand û hunerê de tevî hemû zext, qedexe û dayîna berdêlên giran jî 27 sal li pey xwe hiştin... RÛPEL - 6

# Her roj komeke nû dikeve grevê

### LI SERANSERÊ CÎHANÊ GREV

Hevseroka KCD'ê û parlamenter Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin, 32 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de ketiye greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger. Hat ragihandin ku tenduristiya Guven krîtîk bûye û divê dewlet daxwazan qebûl bike. Her wiha piştgiriya ji bo berxwedana greva birçîbûnê li Kurdistan û seranserê cîhanê berbelav dibe. Her roj li deverekê komeke nû ketina greva birçîbûnê radigihîne.


### KOMA DUYEMÎN DEWR GIRT

Parlamentera HDP'ê ya berê Çaglar Demîrel a ku di girtîgeha Kandirayê de dîlgirtî ye, ragihand ku wê tevî 15 hevalên xwe yên siyasetmedar ji bo rakirina tecrîdê dest bi greva birçîbûnê kirine. Her wiha li girtîgeha Tîpa H ya Dîlokê koma duyemîn greva birçîbûnê ya 10 rojan dewr girt. Partiya Çepgir a Fransayê der barê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û grevên birçîbûnê daxuyanî da. Partiya çepgir piştgirî da grevên birçîbûnê û xwest Ocalan serbest bê berdan...RÛPEL - 3




### Ji bo Ocalan meşiyan

Li aliyê din ji bo azadiya Ocalan meş û mîting dewam dikin. Jinên ciwan ên ji bo şermezarkirina tecrîda girankirî ya li ser Ocalan û piştevaniya bi çalakiya Leyla Guven re li Dêrikê dest bi meşê kirin, li navenda Dêrikê ber bi gundê Eyn Dîwêr ve meşiyan. Bi sedan ciwan û şêniyên herêma Firatê li bajarê Girê Spî kom bûn û bi armanca şermezarkirina tecîdê meş lidarxistin... R3



### Weşanên kurdî qedexe kirin

DI FÛARA Pirtûkan a Wanê de ku Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê organîze dike, weşanên kurdî hatin qedexekirin. 150 weşan tev li fûarê bûne û bi dehhezaran pirtûk tên pêşandan lê danasîn û firotina pirtûkên bi kurdî qedexe ye... R.6



### Derhêner Zebîhî jiyana xwe ji dest da

DERHÊNERÊ kurd Rehîm Zebîhî û birayê wî Keywan Zebîhî di encama qezaya li rêya Nêzero-Baneyê de çûne ser dilovaniya xwe. Hat gotin ku di qezayê de guman hene... RÛPEL - 6



### Ji gel re xurekên xwezayî çêdike

SUHEYLA Bozdemîr berhemên keda destê xwe ji gundê Agaçli ya Şaxa Wanê tîne Wanê û li dikana xwe ya Kolana Meraşê difiroşe. Bozdemîr xurekên xwezayî pêşkêşî gel dike... R.2

## Ji 9 saliya xwe heta niha qurnefîlan datîne Qada Galatasarayê

Dayikên Şemiyê di hefteya 715'an de çalakiya ku li Qada Galatasarayê hatiye qedexekirin li ber avahiya ÎHD'ê ya Stenbolê berdewam kir. Dayikan vê hefteyê aqûbeta Huseyîn Taşkaya yê 25 sal in agahî jê nayê wergirtin pirsî. Keça Taşkaya Serpil Taşkaya wiha got: "Ez ji 9 saliya xwe heta niha her hefte li Qada Galatasarayê qurnefîlan datînim."... R.3



### Li Başûr rê di binê avê de ma

Li Başûrê Kurdistanê ev hefteyek e baran dibare û li hinek herêman lêhî rebû. Rêya Hewlêr û Silêmaniyê li dola Simaqule ji ber lêhiyê hate girtin û wesayît nikarin derbas bibin.



### Hîna zî cenaze nêgirewto

Alî Riza Arslano ke pîyê Hakan Arslano ke Sûrî de cuya xo vindî kerdbî û yeno vatiş ke cenazeya Arslanî kişta Camîyê Hasirli de ameya definkerdiş, seba cenazeya lajê xo 19 reyan ame Amed... R.5



www.arsivakurdi.org



## Li Şehbayê şevbêrka stran û govendê

**ŞEHBA -** Tevgera Çand û Hunerê ya Tel Rifat a Şehbayê bi armanca ku gelê Şehbayê kêfxweş bibe bi dirûşma 'Bi ruhê neteweya demokratîk bixebitin û Efrînê rizgar bikin' şevbêrka stran û govendê li dar xist. Tevî endamên sazî û dezgehan gelek kes beşdarî şevbihêrkê bûn. Jinên ku beşdarî şevbihêrkê bûn peyama berdewamiya berxwedana xwe da. Der barê lidarxistina şevbihêrkê de Rêveberiya Navenda Çand û Hunerê ya Navçeya Tel Rifatê Evîn Bîlel da zanîn ku ji bo moralê gel baş bibe ew her di nava hewldanê de ne û got yên ku xwestin çanda efrîniyan qir bikin dê negihîjin armanca xwe.

# Bi çêkirina wêneyan zilmê vedibêje

Hunermend û nivîskar Cela Hemzawî bi çêkirina wêneyan zilma çeteyên DAIŞ'ê yên li Reqqayê vedibêje. Têkildarî çêkirina wêneyan Hemzawî da zanîn ku di dema dagirkeriya çeteyan de jin gelek zilm ditîne, ji ber vê yekê xwestiye bi çêkirina wêneyan wê zilmê vebêje

Çeteyên DAIŞ`ê ku çend salan bajarê Reqqayê dagir kiribû, nedihişt hunermend karê xwe di bajêr de bikin û bi taybetî jiyana jinan perçiqandibû û nedihişt jin bi reheti bijîn. Hunermend û nivîskar Cela Hemzawî jî yek wan kesan e ku rastî zilma DAIŞ'ê ya giran hatiye.

Cela Hemzawî (38) di beşa çand û hunerê de dixebitî û gelek dîwanên wê hene. Hemzawî beşdarî gelek mîhrîcanên wêjeyî û helbestan bûye, her wiha xebatên siyasî jî dike. Hemzawî wekî gelek jinên Reqqayê zehmetî ji ber kiryarên çeteyên DAIŞ`ê dîtine, ji bo wê Hemzawî neçar maye ku karê xwe yê pîşeyê berde. Lê bi rizgarkirina bajêr a ji aliyê HSD`ê ve Hemzawî careke din vegeriya pîşeya xwe.

Der barê mijarê de Hemzawî ku bi rêya tabloyên xwe zehmetiyên jinên Reqqayê di serdema çeteyên DAIŞ`ê de vedibêje, ev tişt anî ziman: "Em wek jinên Reqqayê me gelek zehmetî kişandin, çeteyan nehişt em bi asayî bijîn, gelek cureyên tundiyê li ser me dan meşandin û gelek jin revandin û kuştin."

Hemzawî bi bîr xist ku piştî rizgarkirina bajarê Reqqayê û vejandina çandê di Meclisa Sivîl a Reqqayê de, wan dest bi pêkanîna pîşeya xwe kiriye. *REQA*



## Tevgerên gerîla û jinan



Ger sedsala 20'an serdema şoreşan be bêguman Amerîkaya Latîn dê mekanê şoreşê be. Di sedsala 20'an de di nava çend salan de li heman herêmê tevgerên şoreşger-hilweşandina dîktatoran, li dijî newekeviya aborî derketin û pêşengê şoreşa Kuba Che Guevara ku dibêje 'mirovê nû' dike armac tevger derketin holê. Lê gelek ji van mirovên nû ne 'zilam' bûn. Bi giştî piştî nîveka sedsalê êdî bi hezaran jin jî ev kom ava kirin.

Mijara pirtûka Karen Kampwîrth 'Tevgerên Gerîla û Jinan' jî qala jinan dike. Kampwîrt qala jinên ku ji Nîkaraguayê, ji El Slavadorê û ji eyaleta Chiapas a Meksîakyê beşdarî tevgerên şoreşê û şervantiya wan dike.

Pirtûk ji çar beşan pêk tê û bêşên wê wiha ne;

Rola Nû ya ji bo Keçên Sandînoyê

Meydana Jinan a li Dijî Rêvebeniya Leşkerî ya li El Salvadorê

Raperînek Din a Jinekê: Derketina Holê ya Artêşa Zapatîstayê

Jinûvenirxandina Tevgerên Jinan û Gerîla: Vegera Kubayê

**Edîsyona sedsala 21'an; YPJ**

Di beşa dawî ya pirtûkê de Kampwîrth li welatê ku hevdîtin kirine, tevlêbûna jinan a di nav tevgerên gerîla de, dide ber Kubaya salên 1950'î ku kêm jin tev li têkoşîna gerîla bûbûn.

Bêguman siberojê edîsyona sedsala 21'ê ya vê pirtûkê jî dikare were kirin û di rewşeke wiha de YPJ û Şoreşa Rojava dê xwedî cihekî girîng be.

*Jêder: Yenî Ozgur Polîtîka BRUKSEL*



## Berdewamiya têkoşîna jinên leheng e

Hevseroka KCD û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ji ber tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest bi greva birçîbûnê kiribû. Jinên Hesekê jî piştgirî da Guven û got ku Guven berdewamiya têkoşîna jinên leheng ên wekî Sakîne, Arîn, Barîn û Bêrîtanan e.

Jina bi navê Mehabat Şêx Seadûn berxwedana zindana silav kir û wiha got: "Em ê heta dawî li berxwedana zindanan xwedî derkevin. Ji bo azadiya Reberê xwe em ê her li ser pêyan bin. Leyla Guven sembola jina azad e, em ê heta dawiyê piştgiriyê bidin çalakiya wê. Leyla berdewamiya têkoşîna jinên leheng ên wekî Sakîne, Arîn, Barîn û Bêrîtanan e. Dîroka berxwedanê bi hêza jinê zindî dibe"

Endama Şaredariya Gel a Taxa Şerqî, Hemdiya Musa Celîl diyar kir ku bi hêza jina azad bendên faşîzmê dê werin hilweşandin û ev tişt vegot: "Em dev ji çalakiyên ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bernadin û em ê her li ser pêya bin. Heta ku zilm û zordestî biqedin em ê têkoşîna xwe bidomînin û piştgiriyê bidin çalakiya Leyla Guven." *HESEKÊ*

## Ji bo azadiya Ocalan li ber xwe didin

Piştgiriya ku ji bo çalakiya Leyla Guven her diçe mezin dibe. Jinên Ereb ên li Girkêlegê jî piştgirî dan çalakiya Guven û diyar kirin ku Guven îradeya jinên têkoşer e û ew mînaka berxwedanên bêhempa ye.

Jina bi navê Hefîza Mehmûd da zanîn ku ji bo azadiya Ocalan dê tu carî hêviya xwe winda nekiriye û wiha got: "Em îro wekî jinên ereb xwe bi felsefeya Rêber Apo bi rêxistin dikin. Loma kes nikare me ji şopa doza azadiyê vegerîne. Mirov bi têkoşîna xwe dikare hebûna xwe mayînde bike. Ji bo mafê Rêber Apo em her di nava têkoşînek mezin de ne. Em hêvî dikin ku ew ê rizgar bibe."

Her wiha Xewla Mûsa jî ev tişt anî ziman: "Em îro di nava rojên dîrokî de jiyana xwe didomînin. Têkoşîna ji bo Rêber Apo xwedî dîrokek bi qiymet e. Bi saya fikrên wî em gihaştin serkeftinê. Heta ku dîwarên Îmraliyê bê hilweşandin em ê li ber xwe bidin. Tecrîda li ser Rêber Apo tecrîda li ser hemû jinan e. Em ê bi dildarî heta dawî piştgiriya xwe bidomînin. Leyla Guven ji bo me mînaka hêz û îradeyek mezin e. Ew mînaka berxwedanên bêhempa ye. Em ê heta dawiyê piştgiriya çalakiya Leyla Guven bikin û ji bo azadiya Rêber Apo li ber xwe bidin." *GIRKÊLEGÊ*




Hefîza Mehmûd



Xewla Mûsa



## Suheyla xurekên xwezayî pêşkêşî gel dike

Suheyla Bozdemîr berhemên keda destê xwe ji gundê Agaçlî ya Şax a Wanê tîne Wanê û li dikana xwe ya Kolana Meraşê difroşe. Bozdemîr anî ziman ku kesên têkiliya wan hîn bi gundan re qut nebûye dest ji berhemên xwezayî bernadin û wiha got: "Em bi berhemên organîk mezin bûn. Niha em dixwazin zarokên me jî wisa mezin bibin. Êdî her tişt ji fabrîqeyan dertê. Her tişt bi hormon e. Em nizanin çi tev li xwarinan bûye. Ji ber vê em berhemên organîk pêşkêşî gel dikin."

Di axaftina xwe de Bozdemîr diyar kir ku ji gundê Feraşîn şîr, mast û penîr anîne, ji gundê Agaçlî jî hêk anîne û her wiha gihayê xwarina navdar a Wanê keledoş, cacik, hingiv, sebze û fêkiyên hişk, gelek nebatan tîne dikanê xwe.

Her wiha Bozdemîr anî ziman ku herî zêde jin berhemên xwezayî tercîh dikin û naxwazin zarokên wan xwarinên fabrîqeyan bixwin. *WAN*

## Ji bo ji çeteyan rizgar bibin 3 hezar dolar dane



Piştî êrîşên dewleta tirk û komên girêdayî wê yên li ser Efrînê bi hezaran mirov bi zext û zordestiyên cur bi cur re rû bi rû man. Jina bi navê Cîhan Elo jî yek ji wan e ku bûye şahidê zilma li ser gelê Efrînê.

Elo anî ziman ku her cure zordestî li gelê Efrînê dihat kirin û wiha domand: "Berî ku dewleta tirk êrîşî me bike em jiyanek aram dijiyan. Lê piştî êrîşan Efrîn li me kirin dojeh û li ser axa xwe em bûn penaber. Çeteyên di bin sîwana dewleta tirk de mirov direvandin û ji wan fîdye dixwestin, ên ku nedan jî dihatin kuştin. Destdirêjiyê li jinan dikirin û jinên li dijî vê yekê radibûn jî di bin navê namûsê de qetil dikirin. Sînorê tundiyê tune bû. Her cure tundî li ser gelê Efrînê dihat ferzkirin. Di bin zilm û zordestiyê û di bin dengên tank û topan de zaroka min çavên xwe li cîhanê re vekir. Gelek zarokên din jî bi vî rengî hatin dinê."

**Berê xwe dan kampê**

Her wiha Elo destnîşan kir ku gelek kesan dixwest ji zilma çeteyan rizgar bibin lê nikaribûn û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Gelek mirov ji aliyê çeteyan ve dihatin girtin û dikirin girtîgehê. Hinek bi îşkenceyê dihatin kuştin. Gelek kesên ku dixwestin ji zilma çeteyan rizgar bibin lê nikaribûn rizgar bibûna. Em jî tevî gelek zehmetiyên mezin de rizgar bûn. Tevî ku rewşa me ya aborî ne baş bû jî ji bo em ji zilma çeteyan rizgar bibin me 3 hezar dolar da. Em hatin kampa Berxwedanê ya kantona Şehbayê. Li vir bawerîya me bi şervanên YPG û YPJ'ê tê." *ŞEHBA*

## Jinên Partiya Komunîst û kurd li hev civiyan

Partiya Komunîst a Fransayê (PCF) û Tevgera Jinên Kurd a Fransayê (TJK-F) li hev civiyan û qala têkoşîna siyaseta kurdan û Tevgera Jinên Kurd kirin. Alîkara Şaredarê Parîsê Helene Bidard û Berdevka Tevgera Jinên Kurd Bêrîvan Firan di civînê de axivîn.



Di civînê de li ser greva birçîbûnê ya Leyla Guven, 3 jinên siyasetmedar Sakîne Cansiz, Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan ên ku di sala 2013'an de li Parîsê hatibûn qetilkirin, Akademiyên Jineolojiyê û Gundê Jinwarê hat sekinandin.

Bêrîvan Firat qala siyaseta kurdan, têkoşîna jinên kurd û rewş û tecrîda li ser Ocalan kirin.

Helene Bîrard jî qala serdana xwe ya di sala 2015'an de ya bakurê Kurdistanê kir û wiha got: "Li wê derê pergala hevserokatiyê heye lê ev pergal li nav şaredariyên Fransayê û di nav partiya me de tune ye." *PARÎS*

www.arsivakurdi.org

# Grev li girtîgehan belav dibe

Parlamentera HDP'ê ya berê Çaglar Demîrel a girtî ragihand wan komek ji 15 siyasetmedaran bi armanca xwedîderketina daxwaza Leyla Guven dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirine. Her wiha ji bo rakirina tecrîdê li her derê gelê kurd û kurdistanî li ser pêyan e

Ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya bi parlamentera HDP'ê ya Leyla Guven ku ev 32 roj in di greva birçîbûnê de ye, çalakiyên li girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê hatibûn destpêkirin roj bi roj bi tevlêbûnên nû berfireh dibe.

Parlamentera HDP'ê ya berê Çaglar Demîrel ku niha li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Tîpa F a Kocaeliyê tê ragirtin, bi rêya parêzerên xwe peyamek şand û ragihand ji bo piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ya Leyla Guven bi 15 hevalên xwe yê siyasetmedar re dest bi greva birçîbûnê kirine.

Demîrel di peyama xwe de ev tişt vegot: "Ji bo piştgiriya hevala me Leyla Guven ji îro û pê ve min û 15 hevalê xwe yê siyasetmedar re dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya 10 rojan kir. Daxwaza Leyla Guven daxwaza bi milyonan e. Divê demildest dawî li tecrîd û îzolasyonê bê anîn. Derbasbûna tevgerbûyîna ji bo aştî û demokrasî elzem e û di qonaxeke dîrokî de ye. Em bang li hemû hêzên demokrasiyê dikin ku li dijî sûcê mirovahiyê serî rakin û têkoşîna demokratîk mezin bikin. Pêwîst e her kesek bibe Leylayek û bi vê hişmendiyê tevbigere." *AMED*



## Ciwanan ji bo azadiya Ocalan li ser pêyan e




Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyeyê li kantona Girê Spî bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Ocalan meşek li dar xist. Bi sedan ciwan û şêniyên herêma Firatê tev li meşê bûn.

Meş ji Çerxerêya El Îskan a bajarê Girê Spî dest pê kir û li Çerxerêya El Belediye veguherî mîtîngê. Di mîtîngê de ji aliyê endama Meclisa Malbatên Şehîdan Meyada Naman û ji rêveberên Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyeyê ve axaftin hatin kirin. Axaftvanan diyar kir ku divê demildest tecrîda li ser Ocalan rabe û Ocalan azad bibe.

Bi heman armancê di 7'ê kanûnê de ji aliyê jinên ciwan ên Qamişloyê bi dirûşma 'Ji bo bidawîkirina dagirkeriyê û rizgarkirina Rêber Ocalan serî hildin' meş hatibû destpêkirin. Jinên ciwan di meşê de berxwedan Ocalan a li Îmraliyê û jinên berxwedêr ên li girtîgeha de li dijî tecrîd û dewleta tirk li ber xwe didin, silav kirin.

Her wiha çalakiya greva birçîbûnê kul i navçeya Çilaxa ya kantona Qamişloyê ji bo du rojan hatibû destpêkirin bi daxuyaniyekê bi dawî bû. Di daxuyaniyê de hat gotin ku heta azadiya Ocalan çalakiyên wan bidomin. *GIRÊ SPÎ - QAMIŞLO*

## Dê lêgerîna heqîqetê bidome



Dayikên Şemiyê di hefteya 715'an de çalakiya ku li Qada Galatasarayê hatiye qedexekirin li ber avahiya ÎHD'ê ya Stenbolê berdewam kir. Dayikan vê hefteyê aqûbeta Huseyin Taşkaya yê 25 sal in agahî jê nayê wergirtin pirsî.

Ji aliyê din ve Xizmên Windayan ên Amed û Êlihê jî bi dirûşma 'Bila winda bên dîtin û kujer bên darizandin' di vê hefteyê de aqûbeta xizmên xwe pirsîn.

Di hefteya 513'an a Amedê de aqûbeta Mehmet Acar ê k udi sala 1994'an de li Mezraya Zûra ya gundê Dirsekli ya Cizîr a Şirnexê hat revandin û windakirin, hat pirsîn û di hefteya 419'emîn a Êlihê de jî aqûbeta Alî Gunduz ku di 22'yê tebaxa 1998'an de li ser rêya Êlih û Kercewsê hatiye windakirin, hat pirsîn.

Her wiha di çalakiyan de hat gotin ku bi fermana rayedarên dewletê, mirov li kolanan hatin revandin û windakirin û da zanîn ku dê lêgerîna wan a heqîqetê heta dawiyê bidome. *AMED - STENBOL*

## Qeyûmên li Kurdistanê li pey dek û dolaban e

Rejîma faşîst a AKP-MHP'ê ku li her çar parçeyên Kurdistanê çav berdaye destkeftiyên gelê kurd, êrîşên xwe yên talan û wêraniyê berdewam dike. Rejîma faşîst a ku di çarçoveya konsepta tunekirina destkeftiyên gelê kurd de li bakurê Kurdistanê êrîşên hovane yên siyasî, civakî û leşkerî pêk tîne, bi rêya qeyûman jî dixwaze van destkeftiyan têk bibe. Piştî ku qeyûm tayînî şaredariyên DBP'î hatin kirin jî, qeyûmên rejîma faşîst talaneke bêsînor kirin.

Yek ji şaredariyên ku qeyûmê AKP'ê ku di 11'ê îlona 2016'an de ji hêla Wezareta Karê Hundir ve hatiye tayînkirin jî, qeyûmê Şaredariya Cizîrê ye. Qeyûmê ku ev sê sal in li Cizîrê êrîşî nirxên civakî, çandî û siyasî dike, niha jî dixwaze bi dek û dolaban hundirê şaredariyê vala bike. Qeyûmê ku dizane dê şaredariyê winda bike, hewl dide ku hemû milkên şaredariyê dewrî AKP'ê bike. Li gorî agahiyan, Navenda Çanda Jinan a Sitiya Zîn a ji aliyê jinên AKP'î ve tê bikaranîn û Navenda Zanistê ya ku hîn tê çêkirin, çend ji milkên ku qeyûm dixwaze dewrî Îdareya Bajêr a Taybet bike ne.



**Şaredarî veguherandiye buroyê**

Her wiha Desteya Hilbijartinê ya Bilind (YSK) diyar kiribû ku kesên ji bo hilbijartina herêmî ya 31'ê adara 2019'an bibin namzet divê herî dawî heta 1'ê kanûnê ji peywira xwe ya heyî îstifa bikin. Ev yek ji bo qeyûmên tayînî şaredariyên DBP'î hatine kirin jî derbasdar e. Lê belê qeyûm Cûmalî Atîlla yê tayînî Şaredariya Mezin a Amedê hat kirin û ji bo hilbijartina herêmî bû namzetê AKP'ê hîn jî îstifa nekiriye, berevajiyê vê yekê xebatên xwe yên ji bo hilbijartinê jî li avahiya şaredariyê bi rê ve dibe. *AMED - ŞIRNEX*

## Rayedar hewl didin çalakiyê bişikînin!

NAVENDA NÛÇEYAN

Di 27'ê mijdarê de li ser navê girtiyên PKK û PAJK'ê Denîz Kaya bi daxuyaniyekê aşkera kiribû ku dê li hemû girtîgehên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê ji bo şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger dikin. Piştî daxuyaniya Denîz Kaya girtiyên siyasî dest bi grevê kir. Li dijî vê çalakiya girtiyan, zext û pêkutiyên kêfî yên rayedarên girtîgehan jî zêde bûn. Yek ji girtîgeha ku girtî di grevê de ne jî, Girtîgeha Tîpa T ya Siwêrek a Rihayê ye. Girtiyê bi navê Remzî Bayram bi rêya malbata xwe zext û pêkutiyên li girtîgehê ragihand.

Bayram da zanîn ku rayedarên girtîgehê zextan li çalakgerên greva birçîbûnê dikin ku çalakiya wan bişikînê û her wiha gefan li wan dixwe. Bayram destnîşan kir ku rayedarên girtîgehê gefa 'heke hûn çalakiya xwe bidomînin, em ê we biavêjin hucreya yekkesî'li wan xwariye. Bayram diyar kir ku rêveberiya girtîgehê bi zextên cuda dixwaze vîna wan teslîm bigirin. Bayram got ku tu hêz nikare çalakiya wan bişikîne û hemû hevalên wan jî bi biryar in ku tecrîda li Îmraliyê bişikînin.

**Bang li saziyên têkildar kir**

Bayram her wiha ji bo balê bikişîne ser îşkence û pêkutiyên li girtîgehan, bang li raya giştî kir û bi taybetî xwest ku Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û saziyên têkildar li dijî vê rewşê têkevin nava hewildanekê.




## Li dijî tecrîdê piştgiriya navneteweyî

Piştgiriyên navnetewî yên ji bo rakirina tecrîdê û greva birçîbûnê ya Leyla Guven jî her diçe mezin dibe. Di çarçoveya van piştgiriyan de Partiya Çepgir a Fransayê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Partiya Çepgir diyar kir ku Ocalan rêberê tevgera azadiyê ya kurdan e û wiha got: "Partiya Çepgir piştgiriyê dide têkoşîna azadiya Abdullah Ocalan û divê PKK ji lîsteya rêxistinên terorîst were derxistin. Her wiha serbestberdana Ocalan ji bo demokrasî, gelên Rojhilata Navîn, Tirkiye û Kurdistanê dê çareseriyeke siyasî ya rastîn bide destpêkirin."

Her wiha di heman mijarê de parlamenterê Partiya Çepgir ê Swêd Danîel Rîazat jî axivî û diyar kir ku li Tirkiyeyê bêyî ku delîlek berbiçav hebe muxalîf têne girtin û tecrîda li ser Ocalan dijhiqûqê ye û wiha got: "Kesên ku di mijara kurdan de ne xwedî helwesteke zelal in jî tecrîda li ser lîderekî wiha ku temsîla bi milyonan kurd dike, nikare qebûl bike. Ev derî aqil e."

Rîazat ku xwest tecrîda li ser Ocalan demildest bi dawî bibe, anî ziman ku divê ji bo azadiya Ocalan raya giştî ya navneteweyî were avakirin. *STOCKHOLM - PARÎS*

## Divê li her qadê çalakî geş bibin

Kurdistaniyên li bajarên Ewropayê ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgirîdayîna Leyla Guven her roj di çalakiyan de ne.

Bi boneya şermezarkirina tecrîdê û piştgirîdayîna Guven kurdistanî û dostên wan li bajarê Sydneyê yê Avûstralyayê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin.

Kurdistaniyên li paytexta Danîmarkayê Kopengehê jî bi daxuyaniya çapemeniyê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Di daxuyaniyê de hat gotin ku heta Ocalan azad nebe dê têkoşîn bidome.

Her wiha çalakiya greva birçîbûnê ku li dijî tecrîdê hatine destpêkirin li gelek bajarên Ewropayê ji aliyê kurdistaniyan ve didomin.

**Ji bo çalakiyan bang hat kirin**

Der barê çalakiyên li Ewropayê de Dîwana Hevserokatiyê ya KONGREYA GEL daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku daxwaza Leyla Guven daxwaza hemû kurdan e û ev bang hat kirin: "Banga me jî ya li gelê me ew e ku bi dirûşma 'Em tecrîda Îmraliyê bişikînin, li Tirkiyeyê faşîzmê hilweşînin û li Kurdistanê demokrasiyê bi cih bixin' li hemû qadên jiyanê berxwedanê geş bikin. Dem dema berxwedanê ye." *BRUKSEL*



## 'Daxwaza Leyla Guven daxwaza me ye'

HDP'a Mezitlî ya Mêrsînê 2'yemîn Kongreya xwe ya Awarte li avahiya navçeyê pêk anî. Di kongreyê de endamên Rêveberiya HDP'ê ya navendî Mehmet Yurek, endamê Meclisa HDP'ê Nazim Kok û Abdulselam Demîrkiran jî gelek kesên din amade bûn. Kongre bi hilbijartina dîwanê û rêzgirtinê dest pê kir. Hevserokê HDP'ê yê Mêrsînê Mustafa Işik bal kişand ser pêvajoya siyasî û anî ziman ku ew dê li dijî zext û zordariyan têkoşîna xwe bêtir bilind bikin.

Endamê Meclisa HDP'ê Abdulselam Demîrkiran jî bal kişand ser çalakiya Leyla Guven û girtiyên PKK-PAJK'ê yên li dijî tecrîdkirina Ocalan û ev tişt anî ziman: "Birêz Leyla li dijî tecrîdê 32 roj in di çalakiyê de ye. Ji bo tecrîd bi dawî bibe ketiye çalakiyê. Daxwazên Guven daxwazên me ne. Em dixwazin demek berî demekê daxwazên Guven ên li dijî tecrîdê pêk bên." *MÊRSÎN*




www.arsivakurd.org



## Li gorî Rûhanî zextên DYA'yê 'terorîzma ekonomîk' e

**TEHRAN -** Serokkomarê Îranê Hasan Rûhanî li Tehranê di konferanseke herêmî de axivî û diyar kir ku zextên DYA'yê yên li dijî Îranê neheq û wekî terorîzmeke aşkera ye. Rûhanî wiha got; "Bi terorîzma ekonomîk re hewl didin aboriya welatekî têxin panîkê û li ser dewletên din tirsê bidin avakirin. Ev êrîşeke kurewî ye û hem gefan li serxwebûn û nasnameya me dixwe û hem jî hewl dide têkiliyên me yên bi welatên din re qut bikin." Rêveberiya DYA'yê di meha gulanê de dev ji peymana nukleer a bi Îranê re berdabû û dîsa dest bi sepanan kiribûn. Pêla spanan a di meha mijdarê de sektora enerjiyê kiriye hedef.

# Li Fransayê pêla bexwedanê bilind bû



Li paytexta Fransa Parîsê çalakiyên berxwedana Êlek Zeran her roj gurtir dibe. Çalakvanan daxwaza bilindkirina çalakiyê li welatî û karkeran kirin ku li hemberî faşîzmê rabin. Her wiha banga îstifayê li Macron hat kirin

Berxwedana Êlek Zeran li tevahiya welatê Fransayê didome. Li gel ku hikûmetê ji baca li ser sotemeniyê ji bo demekê gav paş ve avêt jî bertek kêm nebûn. Ev çar hefte ne Êlek Zer di asta neteweyî de çalakiyan dikin. Li kuçeya Aresene Houssaeyê çalakgeran banga , ''Macron îstîfa'' kir.

Protestoyên Êlek Zeran ku ji 17ê mijdarê ve li seranserê Fransayê berdewam dikin, duh bi çalakiyên gelek mezin li seranserê Fransayê gel û kerkar daketin qadan. Çalakgeran bang li hemû hemwelatiyan kiribûn ku li hemberî politikayên hikûmeta Fransayê dakevin qadan û têkoşîna karkeran mezin bikin û heqdesta xwe bi dest bixin. Bi dehhezaran Êlek Zer, li kolana Şanzelîzeyê ya herî navdar a Parîsê dest bi meşê kiribûn û mudaxeleyeke tund a polîsan li dijî xwepêşanderan pêkhatibû. Hat payîn ku gelek çalakger hatine destgîkirin. Ev jî weke tirsa li hemberî çalekgeran û hilweşina Fransayê hat binavkirin.

Polîs û hêzên ewlekariyê bi gazên îsotê hewil didin çalakvanan belav bikin, lê her diçe protesto xurttir dibin. Ji duh de rageşiya li Fransayê bilind bûye û di encama xwepêşandanan de hêjmara destgîkirinan gihîştiye 481 kesan. Hikûmeta Fransayê 2 roj berê daxwaziyên Êlek Zeran ên wekî betalkirina baca li ser sotemeniyê qebûl kiribû, lê protesto kêm nebûn. Çalakvanan ji hemû beşên civakê xwestin ku li hemberî bac û polîtîkayan derkevin kolanan. Her wiha tînin ziman ku dê heta dawiyê çalakiya xwe bidomînin û daxwaza îstifaya Makron hat kirin. *PARÎS*

## Li Îtalyayê budceya ku YE'ê îtiraz kir hate qebûlkirin



Li Îtalyayê hikûmeta koalîsyonê, li gel îtirazên Komîsyona YE'yê jî budceya 2019'an hate qebûlkirin. Li Meclisa nûneran a ku yek ji pêkhateya parlamentoya Îtalyayê ye, budceya 2019'an ku Komîsyona Yekîtiya Ewropayê bi zimaneki tund li dij derdiket, hate qebûlkirin.

Ji parlamenteran ên ku tev li dengdanê bûbûn, 330 dengê 'erê' dan.Tevgera 5 Stêrkan (S) û Lîga Bakur (Lega Nord) yên ku hikûmeta koalîsyonê pêk tînin tev de 336 kursiyên wan hene.

Kêmderketina budceya 2019'an bû sedema nîqaşên hikûmeta koalîsyonê ku ev çend meh in bi komîsyona hikûmetê re, wê bibe ji sedî 2,4 ya dahata navxwe ji bilî ya jêkuştî ya welêt. Lê rêjeya kêmketina budceya 2018'an ji sedî 1,8 a Dahata Navxweyî ya ji bilî jêkuştî ya welat bû. *ROMA*

## Keştiyeke balafiran a Amerîkayê gihîşt Kendava Erebî



Li gorî ajansa Dengê Amerîkayê keştiya balafiran a Amerîkayê USS John C. Stennis (CVN - 74), piştî 8 mehan vegeriya Kendava Erebî û dê alîkariya şerê li dijî DAIŞ'ê ya li Sûriye û Iraqê û şerê li Afganistanê bike.

Rayedarekî Pentagonê diyar kir ku USS John C. Stennis (CVN - 74) dê peyaman ji hikûmeta Îranê re jî bişîne ku di van demên dawîn de wezîrê parastinê James Mattis wek rêjîmeke derveyî qanûnê bi nav kir. Rayedareki wezareta parastinê ji ajansa Dengê Amerîkayê re wiha got: "Ev tenê pêşandaneke hêza leşkerî ya li hemberî Îranê ye."

Rayedar ku nexwest navê xwe aşkera bike, diyar kir ku bandora hebûna keştiya balafiran a Amerîkayê li Rojhilata Navîn, wek hebûna baregehên leşkerî yên Amerîkayê li Tenef a Sûriyeyê ya nêzî sînorên Iraq û Urdunê ye.

Ajansê diyar kir ku peywira baregeha Tenefê rêgirtina li pêşiya hêzên Îranê û hevkarên wê di Sûriyeyê de ye. Li gorî ajansê USS John C. Stennis (CVN - 74) dê piraniya dema xwe di van hefteyên pêş de li Kendava Erebî derbas bike.

Hêjayî gotinê ye ku ji dema ku keştiya Amerîkayê Theodore Roosevelt di adara borî de ji herêmê vekişiyaye, tu keştiyên balafiran ên Amerîkayê li herêma Rojhilata Navîn tune bûn. *BRUKSEL*

## Agahiyên kesan dê bi hêsanî dikaribin werin bidestxistin

Li gorî pêşniyarnameyekê ku YE'yê qebûl kiriye, agahiyên kesan ên hevdîtinên li ser amûrên elektronîk ên ragihandinê, bi daxwaza welatekî endam rasterast ji hêla şirketan ve wê bikaribin bidin.

Nav heftiyê li gorî pêşniyarnameyek ku li civîna wezîran a dadê ya YE'yê ya li Brukselê pêk hatî, bi daxwaza welatekî endam agahiyên kesan ên mîna e-mail, Whatsapp'ê wê bikaribin werin bidestxistin. Li gorî vê saziyên lêpirsîna edlî ya welatekî YE'yê bêyî ku destûrê ji saziyên welatên din bixwaze rasterast bi şirketên telekomunaskoyonê wê bikaribin van agahiyan bi dest bixin.

Bi vê pêşniyarê re, ku di serî Almanya hin welat li dij derketine, agahiyên der barê welatiyan de, bêyî ku hewceyî bi destûra welatê lê dijî, rasterast wê bikaribin bidin rayedarên welatên din ên YE'yê.

Ev rêbaza ku tê payîn bêhtir di lêpirsînên têkildarî terorîzm û zarokrevandinê de wê sazkar bibe, fikaran bi xwe re tîne. *BRUKSEL*



## Danîmarka dê koçberan sirgunî giravê bike

Li Danîmarkayê koalîsyona muhafazakar û çepgiran di çarçoveya projeyekê de koçberên ku sûc kirine yan jî guman li ser wan hene wê sirgûnî giravekê bikin.

Hikûmeta koalîsyonê ya serokwezîr Lars Lokke Rasmûssen yê partiya muhafazakar û Dansk Folkeparti yê çepgir li dijî koçberan tedbîrên tund werdigirin. Li gorî agahiyên di hevdîtinên budceya di navbera partiyên koalîsyonê de, wê girava Lîndhomen a 100 kîlometre ji paytext Kopenhagê dûr e weke cihê nû yê koçberan were bikaranîn. Wê koçber sirgûnî vê derê werin kirin.

Tê palankirin ku koçberên sûc kirine yan jî bi guman in û yên ku biryara dersînorkirinê ji bo wan hatiye dayîn li vê giravê bêne ragirtin. Ev girava ku xwedî herêmeke 7 hektar kapasîteya wê 125 kes e û tevî ku ji aliyê yekîneyên înfaza cezayê tê birêvebirin jî weke 'girtîgeh' nayê dîtin.



**Al'yê nerazîbûn nîşan da**

Rêxistina Efûyê ya Navnetewî (AI) li dijî planên hikûmetê nerazîbûn nîşan da û diyar kir ku nayê qebûlkirin ku koçber mehkumî giravekê werin kirin. Nûnera AI'yê Claûss Jûûl got, "Eger hikûmeta Danîmarkayê vê biryarê bixe meriyetê wê di serî de Konvonsîyona Cenevre û gelek peymanên navnetewî binpê bike." Li Danîmarkayê ku nifûsa wê 5.7 mîlyon e û di sala 2015'an de 21 hezar serlêdanên penaberiyê hatibûn kirin. Sala derbasbûyî 3 hezar û 500 serlêdan hatibûn kirin. *KOPENHAG*


## Dixwazin agirbesta li Idlibê bi dawî bibe

DYA'yê ragihand Rûsya ya ku îdia dike 24'ê mijdarê li Helebê çekên kîmyewî hatine bikaranîn, dixwaze agirbesta li Idlibê bi dawî bike.

Berdevkê Wezareta Karên Derve ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Robert Palladîno got; "Êrîşa 24'ê mijdarê ya li Helebê ya li dijî rejîmê ku tê îdiakirin bi çekên kîmyewî pêk hatiye 'Propagandaya reş e'." Palladino diyar kir ku îdiaya êrîşê ji aliyê rejîma Sûriyeyê û Rûsyayê ve hatiye kirin û armanca wan têkbirina agirbesta li Idlibê ye. Berdevkê Wezareta Karên Derve ya DYA'yê îdia kir ku 24'ê mijdarê Rûsya û hêzên rejîmê li dijî gel bombeyên çavan dişewitînin bi kar anîne. Li gorî berdevkê wezaretê rejîm û Rûsya ji bo hincetên erîşên komên li Idlibê teza êrîşa bi çekên kîmyewî ya 'muxalîfan' belav dike. *WASHINGTON*



www.arsivakurdi.org




## Amed de şewa kilamanê Kirmanckî (Zazakî)

**AMED -** Amed de grûba ke bi nameyê 'Morcelayê Kirmanckî' newe ameye ronayene, aktîvîteyêka bîne organîze kena. 9ê Kanûne de (siba) do Kafeyê Kitaban ê Gilgameşî yo ke Dîclekentê Amedî de yo konserêk bêro viraştene. Konsero ke hetê Morcelayanê Kirmanckî ra yeno organîze kerdene Celo Boluz bi deyîranê /kilamanê kirmanckî (zazakî) tewrê ci beno. Konser do saet 19.00 de bêro destpêkerene. Morcelayanê Kirmanckî aktîvîteya xo ya verêne de şewa wendişê şîîran organîze kerdebî û şewe rê zaf eleqedarîyêka girde ameyebî ramotene.



# Herinda cenazeyan de vîlla yenî viraştiş

Alî Riza Arslano ke pîyê Hakan Arslano ke Sûrî de cuya xo vindî kerdbî û yeno vatiş ke cenazeya Arslanî kişta Camîyê Hasirli de ameya definkerdiş, seba cenazeya lajê xo 19 reyan ame Amed. Keyeyê Arslanî wazeno destûr bidîyo ke cayo ke yeno vatiş bikinî û cenazeya lajê xo biveji

Seke yeno zanayene 2ê kanûna 2015î de qezaya Sûrî ya Amedî qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan ameybî îlankerdiş. Qezaya Sûrî ya Amedî ke 104 rojî tede pêrodayîşî dewam kerdî de keyeyê ke domanê înan pêrodayîş de şehîd kewtbî ra hîna keyeyê ke cenazeyanê xo nêgirewtî zî estî. Nê keyeyan ra yewe zî keyeyê Hakan Arslanî yo. Hakan Arslan 22ê çeleyê 2016î de qezaya Sûrî ya Amedî de resabî şehadet. Goreyê malumatê kesê ke Sûr de ameyî tehlîyekerdiş û ameyî tewqîfkerdiş cenazeya Arslanî kişta Camîyê Hasirli de ameya definkerdiş.

Muracato ke Alî Riza Arslano ke pîyê Hakan Arslanî yo seba Wezîrîya Karê Zereyî, Walîtîya Amedî û Serdozgerîya Komare ya Amedî kerdbî bi mehneya 'Verê cû ewja de xebata gêrayîşî ameya kerdiş û çîyêk nêameyo dîyayîş' ame redkerdiş. Keyeyê Arslanî ke qezaya Qereyazî ya Erziromî de maneno nizdîyê 3 serrî yo ke hîna cenazeya lajê xo nêgirewto. Serdozgerîya Komare ya Amedî seba cenazeyê Rozerîn Çukur û Ramazan Ogutî zî eynî cewabî dabî, la israrê keyeyê ke cayanê cîya cîyayan ra ameyî ra dima cayo ke yeno vatiş ame kinitiş û cenazeyê Çukur û Ogutî ameybş vînayîş.

**Wa dorme bêro kinitiş**

Keyeyê Arslanî dîyar kerd ke ê cenazeya lajê xo wazenî û ganî destûr bîyo ke seba vetişê cenazeya lajê xo cayo ke yeno vatiş bêro kinitiş û cenaze bivînî. Derheqê babete de Alî Riza Arslano ke pîyê Hakan Arslano ke Sûrî de cuya xo vindî kerdbî û yeno vatiş ke cenazeya Arslanî kişta Camîyê Hasirli de ameya definkerdiş qisey kerd û seba cenazeya lajê xo 19 reyan ame Amed.

**Ma mezelê xo wazenî**

Alî Riza Arslanî seba dîyayîşê cenazeya lajê xo veng da îdarekarê dewlet û hukmatî û wina va: "Ez paweyê cenazeya lajê xo ya. Dewlete baş zana ke cenazeya lajê mi Sûr de ya. Mi berê heme cayan kuta, la ti cewabêk nêdîya mi. Zerrî ya mi vêşena. Madem destûr nêdanî kinitişî, ma do bi îmkananê xo şêrî Sûr. Cayo ke lajê mi merd de nika înşaet yeno viraştiş. Vîla virazîyenî. Ma tena mezelê domanê xo wazenî. Ma şînê domanê xo daxî nêronayo." *AMED*




## Binê pawitişê dewlete de fuhûş

Amed de binê nezaretê dewleta tirkî de tîryak roşîyeno û fuhûş yeno kerdene. Mehlaya Huzurevlerî ya Kayapinarî de bîyayîşê 400 keyeyanê fuhûşî wehametê tablo ramojneno. Sere de qezayê Sûrî, qezayê Baxlar, Kayapinar û Yenîşehîrî yê Amedî binê zextê polîtîkaya şerê taybetî de yê. Mehlayanê Alî Paşa, Îskender Paşa, Azîzoglu û Îsmet Paşa yê Amedî de rotişê tîryakî û fuhûş hendî bîyê çîyê aleladeyî.

Mehlayijî persenê çira rixmê her şewe dewrîyeya Têgêrayîşê Taybetî yê Polîsan (POH) de tîryak û fuhûş nêbeno kemî. Otela Şenolî ke kuçeyê hemverê Mudirîya Asayîşî ya Bajarî ya serê Cadeyê Gazî yê Sûrî de ya seba fuhûşî yena xebetnayene. Mehlaya Îskender Paşayî de zî kesê ke înan ra tewrikkar 'torbacı' yeno vatene eşkera eşkera tîryak roşenê. Semtê Ofîsî de fuhûş keyeyanê apartan ê ke rojane yenê demankerdene de yeno kerdene. Nê keyeyî zî qaşo kontrolê polîsan ra vêrenê. Qezayanê Baxlar û Erxenî de zî nê serranê peyênan de rotişê tîryakî û fuhûş werişto dereceya tewr core.

**Polîsî nê halî xeylî kêfweş ê**

Kafeyê bi nameyê Hayal Kahvesî yo ke serê rayîrê '75 Metrelik Yol'î de yo de tîryak roşîyeno û fuhûş yeno kerdene. Hemwelatijêk ke nêwaşt nameyê xo bido dîyar kerd ke her şewe verê kafeyî de cinîyê ke sey bendeyê seksî yenê xebetnayene raştê meruzê şîdetê camêrdan yenê. Semtê Huzurevlerî yê bajarî de zî hal bi heman hawayî yo.




**Serrê fuhuşî kewto heta 16**

Qezaya Erxenî ya Amedî de zî tîryak û fuhûş resayo dereceya tewr core. Cinîyê ke şerê Sûrîyeyî ra remayê vernî de klubanê sey Yakamoz û Maşîrî yê merkezê Amedî de dima ra zî Erxenî de yenê eciqnayene. 150 metre averê nê kluban de nuqteya polîsî û eskerîye esta. Serrê nê cinîyanê ke yenê xebetnayene zî mabênê 16-30 de yo. *AMED*

## Badê 14ê kanûna 2015î prosesê huqûqî



Qezaya Cizîrî ya Şirnexî de 14ê kanûna 2015î de qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan ame îlankerdiş û heta 2ê adara 2016î dewam kerd. Xeylê kesî pêrodayîşan de cuya xo vindî kerdî û dosyayê ke derheqê mergê înan de ameyî akerdiş zî yew bi yew ameyî padayîş. Seba 86 dosyayan qerarê bêtaqîbî ame dayîş. Seba dosyayê ke ameyî padayîş muracatê Mehkemeya Qanûno Bingeyî (AYM) û Mehkemeya Heqanê Merdiman ya Ewropa (MHME) ame kerdiş.

Serdozgerîya Komarî ya Cizîrî ke tehqîqat taqîp kerdêne domano 14 serrî Hasan Ayazî 'endamê rêxistine' îlan kerde û derheqê dosyayê ci de qerarê bêtaqîbî daye. Hacer Arslan, Sakîne Durmîş û Fatma Demîre zî mîyan de 14 kesê ke cenazeyê înan hîna nêameyê dîyayîş, qerarê 'sînorkerde' rona serê dosyayê înan û dima ra qerarê bêtaqîbî daye. Xeylê dosyayî hîna teslîmê avûkatanê mexduran daxî nêameyî kerdiş.

**Veşênayî la dima ra delîl nêvînayî**

Reyna Gulîstan Eylem Ustun, Berjîn Demîrkaya, Rohat Aktaş û Sakîne Mîraya ke cenazeyê înan bi pêroyî ameyî veşênayîş, dosyayê ke derheqê înan de ameyî amedekerdiş de îfadeyê 'Derheqê xebetnayîşê hêzê bîsîstemî de ti delîlêk nameyo dîyiş' ca girewt. Dosyayê xebatkara NÇMyî Gulîstan Eylem Ustune bi qerarê bêtaqîbî padîya. *ŞIRNEX*

## Grevê vêşanîye roja 3.de yo



Paytextê Swêdî Stockholm de çalakîya grevê vêşanîye ya Kurdistanijan û dostanê înan dewam kena. Vizêr parlamenterê Partîya Çepî Daniel Riazatî çalakîya ke ci rê eleqeya girde esta zîyaret kerd. Riazatî mesajê paştîdayîşî da û vat ke înan sey Partîya Çepî waşt ke PKK lîsteyê terorî ra bêro vetene û semedê bicaardişê naye xebatê înan dewam kenî.

Çalakwanan ra Zerdeşt Îbrahîmo ke Başûrê Kurdistanî ra yo qisey kerd. Îbrahîmî bale ante muhîmîya rolê Ocalanî ser û va: "Ma tena wedartişê tecrîdî nê, esasî de azadîya ey wazenê. Ganî CPT cade şiro Îmrali û derheqê weşîya Ocalanî de bi raporyêk zanayîş bido rayapêroyî."

Îbrahîmî vist vîrî ke bi mîlyonan kesan Ocalan sey rayber qebûl kerdo û wina domna: "No tecrîd heme kurdan rê beno. Başûr de zî şar paştî dano Ocalanî û wazeno ke o serbest bêro veradayene la tersê PDKyî ra eşkera nêeşkeno bîyaro ziwan. Eke ma yew bê, pîya tê bigêrê çew nêeşkeno bi ma." *STOCKHOLM*

## 23 serrî yo ke edalet wazena



Fehmî Tosuno ke dewa Çavundurê ya qezaya Licê ya Amedî de cuyayêne, seba tedayan koçê Stenbolî kerd û 19ê teşrîna verêna 1995î de Avcilarê Stenbolî de bi zor wesayîtêke bi marka Renault yê plaka 34 UD 597 ame esparkerdiş û aye roje ra dima ti xebere ci ra nêame girewtiş.

Waya Fehmî, Kiymet Zengîne dîyar kerde ke pêwa ke muracatê heme rayîrê qanunî dayê zî tepiştişê Fehmî ameyo înkarkerdiş û wina va: "4 serrî badê birayê mi ez ameya tepiştiş û mi rê vatî 'Ma do to zî sey birayê to bikişê'. Ma dewa berd MHME."

Cinîya Fehmî Tosun, Hanim Tosune nika her hewte şona Raşteyê Galatasarayî û waya Fehmî Kiymet û keyeyê ey zî cigêrayîşê edaletê dewam kenê. *AMED*

## Suheyla xidayê tebîî pêşkêşê şarî kena

Suheyla Bozdemîre dewa Agaçli ya Wanî ra berardişê keda destê xo ana merkezê Wanî û dikanê xo yê cehdeyê Maraşî de roşena. Bozdemîre arde ziwan ke têkilîya înan hema bi dewan esta û fek berardişê tebîîyan ra vera nêdanê.



Bozdemîre daye zanayene ke neslê înan wina pîl bîyo û wina domnaye: "Ma bi berardişê tebîî pîl bîyî. Nika ma wazenê domanê ma zî wina pîl bibê. Êdî heme çî fabrîkayan ra vejîyeno. Heme çî bi hormon o. Ma nêzanê çi fînayî zereyê werdî. Coka ma berardişê tebîî pêşkêşê şarî kenê. Ez dewa Feraşîn ra şit, mast û penêr ana û dewa Agaçli ra zî hakan ana. Ez vaşê namdar yê Wanî Keledoş, cacik, hingimên, sebze û fêkîyê wişk û xeylê nebatan ana dikan. Tewr zêde cinî berardişê tebîî tercîh kenê û nêwazenê ke domanê înan werdê fabrîkayan biwerê." *WAN*

## Tena doktorêka cinî esta

Nêweşxaneyê Dewlete ya Nisêbînî badê pêrodayîşan texrîb bibi û amebi rijnayîş. Herinda nêweşxaneyê newe bibi qerekol û qeza bi no hewa xizmetê weşî ra bêpar mendib.

Dima ra nêweşxaneyêke newe ame viraştiş, la nika zî kêmasîyê doktor û hacetan vera şar acis bî. Nêweşxane de makîneyê Emarî çin o û tena yew doktorêka nêweşîya cinîyan esta. Xeylê nêweş î sewqê cayê bînan benê.

Şar bi saetan sira de maneno û xeylê nêweşan zî eşrawenê cayê bînan. Cinîya bi nameyê E.ye va: "Ez serê siba ra sira de ya ke fîş bigîra. Doktorî vanê hacetê lazim çin ê. Qezayo ke 120 hezar nufusê aye esta de makîneyêke emarî çin o." *MÊRDÎN*

# NÇM dibêje; ‘Bi hev re’

*NÇM ya di qada çand û hunera kurdî de li dijî pişaftinê pêngavek dest pê kir, 27 saliya xwe pîroz dike. Hunermendên NÇM’ê dê bi dirûşma “Bi hev re” salvegerê pîroz bikin û hunermandan banga beşdariyê kir*

**Yasîn KOBULAN / STENBOL – MA**

Yek ji saziyên ji bo pêşveberina ziman, çand û hunera kurdî ya li Tirkiyeyê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) ye. NÇM tevî hemû zext, qedexe û dayîna berdêlên giran jî 27 salan li pey xwe hiştin.

Di 27’ê Îlona 1991’an de zanyarê kurd Musa Anter, civaknas Îsmail Beşîkçî û hunermend Alî Temel jî di nav de ji aliyê komek rewşenbîr û hunermendên kurd ve li Stenbolê hat damezrandin. NÇM’ê ji wê rojê ve li dijî pişaftina ziman, çand û hunera kurdî û polîtîkayên înkarê bi perspektîfa “jiyana azad, hunera şoreşger” xebatên xwe dewam dike. NÇM xebatên mîna şano, sînema, muzîk, dansên gel, dansa hemdem û gelek xebatên din dike. Ev navend bû dengê gelên Mezopotamya, Anatolya û Rojhilata Navîn. Piştî îlankirina OHAL’a di 2016’an de gelek şaxên NÇM’ê li bajarên mîna Edene, Îzmîr, Amed, Dîlok, Riha û gelek saziyên din ku xebatên çandê bi rê ve dibirin hatin girtin.

NÇM dê îro li Navenda Pêşandanê ya Bostanciyê şahiya salvegera 27’emîn bi slogana “Bi hev re” li dar bixe. Di şeva salvegerê de hunermendên mîna Mizgîn Tahir, Yelda Abbasî, Ferhat Tunç, Arhat, Denîz Esmer, Ferît Elalmiş, ji Koma Gulên Xerzan hunermend Çiya, ji Koma Çiya hunermend Genim, Mervan Tan, Nurcan Degîrmencî, Nurhak Kilagoz, Ruken Yilmaz, Serhat Kural, Talat Yeşîl û Weysî Ermiş derkevin ser dikê û hunera xwe pêşkêş bikin. Her wiha dê dengbêj, Dansa Mezopotamya, Teatra Jiyana Nû, berhemên sînemeya Mezopotamya bên pêşandan.

**Rêwîtiyeke 27 salan**

Yek ji xebatkarên NÇM’ê Nurcan Degîrmencî ji damezrandina NÇM’ê heta roja îro wek “Rêwîtiyekê” pênase kir û got: “Gelek navên girîng di vê rêwîtiyê de cih girtin. Li Amed, Botan, Serhed û Çukurovayê gelek şaxên wê vebûn. Civak, çand û hunerê anî ba hev. Ciwan, zarok û jinan bi çanda wan da perwerdekirin.”

Degîrmencî da zanîn ku tevî hemû zext û girtinan jî NÇM di qada çand û hunerê de li ber xwe dide û dewlet naxwaze ku qadek hilma xwe bide û bistîne. Degîrmencî got dewlet bi polîtîkayên xwe yên taybet bi zanebûn çand û hunera kurdî arasteyî cafe û cihên mîna wê dike û divê ev polîtîka bê redkirin û ji bo vê yekê dem dema tevgerîna bi hev re ye.

Degîrmencî li dijî hemû zextan her kesî vexwend şahiya salvegera 27’emîn a NÇM’ê.




**Di hunerê de rola NÇM’ê**

Sînemager Veysî Altay jî diyar kir ku NÇM’ê ji roja avakirina xwe ve ji bo pêşketina çanda kurd xebatên girîng bi rê ve bir û got: “Ji roja damezrandinê ve heta niha her tim rastî zextên hêzên asîmlasyonger hat. Tevî van hemû zextan jî NÇM’ê mora xwe li bin xebatên girîng xist. Her ku wan me tune hesiband, em jî geş û mezin bûn. Salvegera 27’emîn jî ji bo vê yekê girîng e. Salveger xwedî wateyek xwe heye. Ji bo vê yekê em hemû kesî vedixwînin şahiya xwe.”

**Tovên xwe belav kir**

Yek ji şanogera Teatra Jiyana Nû û ku bi salan e xebatên NÇM’ê bi rê ve dibe Rûgeş Kirici jî bi bîr xist ku di salên 90’î de li bajarên kurdan koçberiyek mezin pêk hat û vekirina NÇM’ê di wê serdemê de xwedî rolek girîng bû. Kirici got: “NÇM di serdemek ku çerxa asîmîlasyonê di asta herî jor de bû vebû. 27 sal in hebûna xwe diparêze. Tovên wê li her deverê belav bû. Li gelek bajaran şaxên xwe vekir. Ji bo pêşvebirina çand û hunera kurdî di cihek herî girîng de sekinî. Şahiya me ya ‘Bi hev re’ jî gelek girîng e. Gel heta îro li hemû çalakî û şahiyên me xwedî derket. Wê gelê me bi awayekî xurt xwedî li vê şahiya me derkeve.”


## Hejmara nû ya Zendê derket

Hejmara 26’an a Kovara Zendê ya weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê derket. Kovar bi naverokek têr û tije gihîşt ber destê xwîneran.

Di vê hejmarê de gelek gotarên der barê ziman, wêje, dîrok û folklora kurdî de cih digirin. Xebatkarên kovarê ji xwîneran xwest kovarê bixwînin û jê nemînin û gotin “Lêkolîn bi kurdî xweş e!”

Ev hejmar bi gotara Yehya Elewîferd dest pê dike ya bi navê ‘Weznên Hêjayî di Helbesta Kurdî’ de dest pê dike. Mamoste Elewîferd di vê gotara xwe de balê dikêşe ser wezna hêjayî ya helbestên kurdî, nemaze jî helbestên zarokan.

Piştî vê nivîsê, gotara Umîd Demirhan a der barê ‘Devoka Feylî ya Zaravayê Kelhurî’ tê. Demîrhan di vê gotarê de pêşî der barê cih û warê kurdên feylî de agahiyan dide û piştre jî rêzimana devoka feylî bi mînakan pêşkêş dike û li ber wan jî kurmanciya wan dinivîse. Li pey vê nivîsê jî gotara Samî Tan a bi navê ‘Raborîya Xebatên li ser Kurdî’ tê. Di vê gotarê de xebatên ku der barê zimanê kurdî de hatine kirin, yek bi yek têne nasandin. Yek ji nivîskarên Zendê yê domdar zimanzan Zana Farqînî ye. Di vê hejmarê de jî Farqînî mijareke der barê rêzimana kurdî de hildaye dest û ew lêkerên dariştî û gireyên lêkersaz rave û şîrove dike.




Li gel van nivîsên der barê ziman û zaravayên kurdî de, hinek gotarên der barê dîrok û çanda kurdî de jî di vê hejmarê de balê dikêşin. Gotara Eyyup Subaşî ya bi navê ‘Heft-Xwana Rûstemê Zal li gorî Teoriya Monomîtê’ yek ji van nivîsan e. Her wiha gotara Mehmet Gultekîn a bi navê ‘Bandora Şerefnameyê li ser Mem û Zîna Xanî’ jî mînakeke din a der barê wêje û dîroka kurdî ye.

Di vê hejmarê de xebateke balkêş jî hevpeyvîna Umîd Demîrhan a li gel zimanê amerîkî Micheal Chyetî ye. Chyet di vê hevpeyvînê de qala xebata xwe ya li ser ferhenga kurdî-îngilîzî dike û bi bîr û boçûnên xwe yên der barê zimanê kurdî û xebatên ferhengnasiyê de rê nîşanî nifşên nû dide.

Ji bilî van nivîsan, gotara bi navê ‘Durehiya Veşartî: Kurdîbûna Muzîka Tirkî ya Gelêrî’ ku ji îngilîzî hatiye wergerandin û xebata Eyyub Subaşî ya der barê avaniya tebatî ya di çar zaravayên kurdî de şayanî dabaşkirinê ne. Her wiha Şemoyê Memê di vê hejmarê de jî lêkolînên xwe yên li ser dab û nerîtên kurdî didomîne. Di vê hejmarê de ew îcar balê dikêşe ser cih û girîngiya navên di zargotina kurdî de. *STENBOL*



## Derhêner Zebîhî çû ser dilovaniya xwe

**Derhênerê kurd Rehîm Zebîhî û birayê wî Keywan Zebîhî di encama qezaya li rêya Nêzero-Baneyê de çûn ser dilovaniya xwe. Li rojhilatê Kurdistanê gelek hesabên tevna civakî ragihandin ku di qezaya derhênerê kurd Rehîm Zebîhî û birayê wî Keywan Zebîhî de guman hene.**

**Zebîhî sala 1971’an li bajarê Bane yê rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûbû. Zebîhî sala 2005’an di fîlmê “Janî Dabraní Edebî” de qala komkujiya Helepçe û êşên gelê kurd kirin. Filmê Zebîhî yê qala cînayeta jinan dike “Feryad” gelek xelat wergirtin. Derhênerê kurd fîlmên Hawar, Satalayt, Bidawîbûna Şer, Ew Zilamê çûbû Seyranê, Terorîstek Dadikeve, Roja Dawî, Stres, Semaya Rengan, Welatê Efsanê jî çêkirine.** *AMED*

# Weşanên kurdî qedexe kirin



Di Fûara Pirtûkan a Wanê de ku Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê organîze dike, weşanên kurdî hatin qedexekirin.

Dijminatiya qeyûmên AKP’ê ya li dijî zimanê kurdî berdewam e. Ji roja destpêkê ya tayînkirinê heta niha qeyûmên AKP’ê bi awayekî bêperwa êrîşî navend, komele û saziyên ku ji bo zimanê kurdî xebatan dimeşînin dike. Her wiha cih û warên ku bi navê kurdî guherandin û peyker û navên kolanan ên kesayetên kurd rakirin. Ev dijminatiya li dijî zimanê kurdî niha jî li Wanê xwe careke din da der.

Hat zanîn ku Fûara Pirtûkan a Wanê ya ku Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê ya niha ji hêla AKP’ê ve hatiye desteserkirin li dar dixe, li Navenda Fûar û Kongreyê ya EXPO’yê ya Rojhilata Navîn hate vekirin. 150 weşantev li fûarê bûne û bi dehhezaran pirtûk tên pêşandan. Lê rayedarên şaredariyê danasîn û firotina pirtûkên kurdî qedexe kirin.

Xwînerên ku ji bo kirîna pirtûkên bi kurdî çûn fûarê, dîtin ku pirtûkên kurdî hatine qedexekirin. Ji xwîneran re hate gotin ku ‘Rayeya me tune ye ku em karibin di vî warî de daxuyaniyê bidin.’ *WAN*

## LI STENBOLÊ KURTEFÎLMÊN KURDÎ

Şa Performans ku li Taksîma Stenbolê heta niha her lîstikên şanoyê pêşkêşî hunerhezan dikirin niha xebateke sînemayê jî da destpêkirin.

Di vê çarçoveyê de dê îro û sibê kurtefîlmên derhênerên kurd pêşkêşî sînemahezan bikin. 12 kurtefîlmên bi naverok û mijarên cuda yên dê bên pêşandan. Dê fîlmên bi navê “Mij”, “Beyoglu Sînemasi”, “Haziriyek Bo Derengmayînê”, “Mavera”, “Penaber”, “Ez Tsubasa me”, “Bayê kûr”, “Bakiş Açisi”, “Şukran”, “Hêk”, “Mara” û “Hundir” dên cihê xwe di pêşandanê de bigirin. *STENBOL*

